

# KOMELEY XWENDIKARANI KURD LE EWRUPA

(Kurdish Students' Society in Europe)



DESTÛRA KOMELA XWENDEVANÊN  
KURD LI EWROPA

Yek - Nav : Komela Xwendevanên Kurd L i E wropa

Dudo - Armancên bingehî ên wê:

1. Bi hêzkirina pêwendiyê di nava Xwendevanên Kurd li Ewropa û hewldan ji bona bi cihanîna Xwendina wan.
2. Pêkanîna yarmetîya diravî di nava Xwendevanên Kurd li ewropa.
3. Geşkirina zanistîya Nestimaniya Kurd û karkirin ji bona kara gelê Kurd û pirsîyariya wî a nestimanî û beşdarbûn li xebata gelê Kurd ji bona wergirtina mafeyê xweyî çare Nûsî.
4. Nasdana gelê Kurd, welatê wî Kurdistan û pirsîyariya wî a Nestimanî bi gelên Cihanê re.
5. Bi hêzkirina canê alikariyê û Dostanyê di nava Xwendevanên Kurd li Ewropa û Xwendevanên Welatên din de û pêwendikirin li gel rêxistinên Xwendevanan û nexwendevanan ên Nestimanî û Cihanî û hawkarîkirin li gel wan bi pê armanc û çakiya herdu aliyan.
6. Beşdarbûn di xebata gelê Kurd û piştgirtina xebata hemû gelên Cihanê dijî Impiryalizim, Kevneperestiyê û rêjîmê Diktatorî, li pê Azadiyê, Demokrasiyê û Aştiyê li Cihanê de kirin.

Sisê - Komele Kovareke li dûhev derdixe bi navê Kurdistan, ku Organê Komelê ye.

Çar - Endametî :

1. Her Xwendevanekî Kurd yanjî Rûniştvanekî Kurdistan be ku li Ewropa di-xwine dikare bibe Endandam di Komelê de eger:
  - a) Bi Destûra komelê razîbû û karkir ji bona bi cihanîna armancên wê.
  - b) Abûna salan bide ,bi kêmanî sê pawendê Ingilîzî, yanjî li gora wan.
2. Komitîya Liq yanjî komitîya birêbirina giştî divê bawerbin li ser mercên bendên pêşîn di daxwaza Endametyê de.
3. Eger Endam bi pê destûr necû ,yanjî karekî weha kir ku ziyana dîghîne bi Komelê yanjî bi gelê Kurd, xwe tûşî van sizayên xwarî dike:
  - a) Serenc rakêsand( inzar), serşikine kirin( tewbîx) bi biryariya komitîya Liq.
  - b) Sarkirin( Tecmid) bi biryariya komitîya birêbirina giştî.
  - c) Derkirin bi biryariya Kongirê Kistî.

Pênc: Rêxistina Komelê.

Rêxistina Komelê li ser van bingehên xwar tê dîtin:

# KOMELEY XWENDIKARANI KURD LE EWRUPA

(Kurdish Students' Society in Europe)



## 1. Kongirê Giştî :

- a) Pêk tê li wan Endamên tê de amadedibin.
- b) Berztirin desthilata destê Komelêye. Dikare destkariyê di destûra Komelê de bike bi kêmtirin zorbûna deng û di dema yekbûna deng de ew alî bi ser dikeve ku serokê kombûnê pist digre.
- c) Salê carekê tê girtin û di dema pêwist de dikare Kongireyêkî nedidema xwe de bê girtin li serdaxwaza bi kê manî dudo ji sisyan ji Endamên Komelê yanjî dudo ji sisyan ji Endamên K.B.G. û di herdû caran de divê Endamê Komelê bi kêmanî mehekê beri wê bi cih û dema Kongire bizanibin.
- d) Bi tenê Komitiya birêbirina giştî mafeyê danina dem û cihê Kongire heye.

h) Pêşwendina raporê K.B.G. ji Endamên Kongire komitîyek te helbijartin ji bona bi rêbirinên kombûnên Kongire.

## 2. Komitiya birêbirina Giştî K.B.G.: a) Berztirin desthilate di nava du Kongiran de.

- b) Pêk tê li hft Endam û du ciger ku ji bal Kongirê giştî tên helbijartin.
- c) Pêş û paş Kongire komdibe û li kombûna xwe a pêşîn ji nava Endamên xwe Serok, Sikretêrê Giştî, Hejmêrê Giştî û Sikretêrê Nivîsîna Kovara Kurdistan heldibjêrin.
- d) Biroya Sekreteriyat pêk tê ji Serok, Siretêr û Hejmêrê Giştî. Ew biryariyên K.B.G. di nava du kombûnan de bi cîtine û du mehan carekê komdibe.
- h) K.B.G. pirograma Kongire amade dike û di kombûna wî a Pêside dixê ber Endaman.
- w) K.B.G. di nava du Kongiran de car caran komdibe.
- N) K.B.G. xweser berpirsiyare beramberî Kongirê Giştî.

## 3. Desthilatên Serok û Sikretêrê Giştî: a) Serok nameyên Komelê mordike.

b) Serok yanjî zorbûna Endamên K.B.G. bang Endamên K.B.G. û Sekretariyat ji bona kombûnê dikin.

c) Serok û Sikretêrê Giştî kar û barên Komelê dibin birê de bi li hev kirina nav xwe. Li yekem kombûn de a Sekretariyat Serok û Sikretêrê Giştî erkê pêwendikirin li gel Komelê, rêkxiraw û aliyên din yê li dora Komelê pardikin di nava xwe de. Her weha jî erkê serperestîya Liqên komelê jî dikin.

d) di dema diyarnebûna sero Sikretêrê Giştî erkê birêbirina kar û barên komelê dike.

## 4. Liq: a) Pêk tê ji Endamên Komelê li welatekî bi biryariya K.B.G.

b) Berztirin desthilata navçeye û bi kêmanî salê carekê komdibe.

c) Di civîna xweyî salê de Endamên komitiya Liq heldibjêrin.

## 5. Komitiya Liq: a) ji sê Endaman heta pêncan pêktê û di nava xwe de Sekretêr heldijêrin

b) Karê liq dibe birê de û dewreke mezin dilize bi cihanina armancên komelê û biryariyên K.B.G. di welatê tê de kar dike bi mercekî ku ji siyaseta K.B.G. dernekeve.

Şeş- diraviya Komelê: 1) Diraviya Komelê li vanê jêrî pêktê: a) Abûna salan. b) Yarme-Endaman û Dostên Komelê. c) Destketinên calakiyên Komelê. 2) Diraviya Komelê li nava kasa Liq û a giştî bi vî corî par dibe: Kasa liq bi kêmanî 50% ji hatinên xwe di de kasa giştî, beramberî bi vê kasa Liqan dikarin li gora pêwestiyên li kasa giştî yarmetiyê wergirin.